



Agahî û alîkarî ji bo xerîdarên pirçandî

Ma hûn dizanin ku hûn dikarin ji Services Australia re agahî û alîkarî bi zimanê xwe bistînin?

Ji bo ku bi kesekî bi zimanê xwe li ser dayîn û xizmetên Centrelink biaxivin, telefonê **131 202** bikin, ji Duşemê heta Înê, di navbera 8:00 sibehê û 5:00 êvarê de. Karmendên me amade ne ku bersiva pirsên we bidin.

Dema ku hûn telefonê me dikin:

- Divê wê Centrelink Reference Number (CRN) [Hejmara Referansa Centrelink] an jî Customer Access Number (CAN) [Hejmara Gihîştina Xerîdar] li gel xwe hebin.
- Ger hûn CRN an CAN xwe nedin, hûn ê tomara dengî 3 caran bi zimanê Îngilîzî (English) bibihîzin. Piştî cara sêyemîn, deng dê bibêje: "What language please?"
- Navê zimanê xwe bi Îngilîzî (English) bêjin.
- Em ê ji we bipirsin ku hûn zimanê xwe piştrast bikin.
- Piştî wê, ji 6 vebijark yên ku hene, sedema telefonê xwe hilbijêrin.
- Ji kerema xwe re bisekinin heta ku karmendek bersiva telefonê we bide.

Hûn dikarin dema ku hûn telefonê Medicare û Child Support dikin wergerê daxwaz bikin û em ê wan ji we re bi belaşî bi rêz bikin.

Ji bo Medicare, telefonê **132 011** bikin, ji Duşemê heta Înê 7:00 sibehê – 10:00 êvarê, û Şemî û Yekşem 7:00 sibehê – 7:00 êvarê.

Ji bo Child Support, telefonê **131 272** bikin, ji Duşemê heta Înê 8:30 sibehê – 4:45 êvarê.

Hûn dikarin dema ku di navendên xizmetê yên me de derbas dibin jî daxwaz wergerê bikin. Tenê karmendên me agahdar bikin û ew ê wergerêke belaşî ji we re bi rêz bikin. Ger hûn ji bo daxwazkirina dayîn an xizmetan hewceyê wergerandina belgeyan bin, em dikarin ev jî bi belaşî ji we re bi rêz bikin.

Me karmendên ku bi navê Multicultural Service Officers têne zanîn hene, ku bi komên pirçandî û rêxistinên civakî re dixebitin. Ew di çalakiyên civakî de beşdar dibin û serdana rêxistinên din dikin da ku agahî li ser dayîn û xizmetên me belav bikin. Ew koçber û penaberan agahdar dikin ku çawa dikarin ji me alîkarî bistînin.

Serdana servicesaustralia.gov.au/kurdish-kurmanji bikin, li wir hûn dikarin agahî li ser dayîn û xizmetên me bi zêdetir ji 65 zimanan bixwînin, bibînin an bibihîzin.



Information and help for multicultural customers

Do you know you can get information and help from Services Australia in your language?

To speak to someone in your language about Centrelink payments and services call **131 202**, Monday to Friday from 8 am to 5 pm. Our staff can answer your questions.

When you call us:

- you will need your Centrelink Reference Number (CRN) or Customer Access Number (CAN).
- If you do not give your CRN or CAN you will hear the recording 3 times in English (English). After the third time, the voice will say 'What language please'?
- say the name of your language in English (English).
- We will ask you to confirm your language.
- next choose the reason for your call from the 6 options.
- please wait until a staff member answers your call.

You can also ask for an interpreter when you call Medicare and Child Support and we will arrange one for free.

For Medicare call **132 011** Monday to Friday from 7 am to 10 pm, and Saturday and Sunday 7 am to 7 pm.

For Child Support call **131 272** Monday to Friday 8:30 am to 4:45 pm.

You can ask for an interpreter when you go to our service centres. Just let our staff know and they will arrange one for free. If you need documents translated to help you claim a payment or services, we can also arrange it for free.

We have staff called Multicultural Service Officers who work with multicultural groups and community organisations. They go to community events and visit other organisations to share information about our payments and services. They let migrants and refugees know how they can get help from us.

Go to servicessaustralia.gov.au/kurdish-kurmanji where you can read, watch or listen to information about our payments and services in over 65 languages.